# ŞOREŞA ME: AZADKIRINA JIYANÊ

05 - 06 Mijdar 2022

KONFERANSA JINAN A NAVNETEWEYÎ YA 2.

Berlin/Germany

Network Women Weaving the Future

**ZANÎNGEHA TEKNÎKÊ BERLÎN**

**Strasse des 17. Juni 135 / 10623 Berlin**

Network Women Weaving the Future

# Bername

# 5. Mijdar

## 9:00-10:00 Vekirin

The opening will include an overview of the 2018 Women Weaving Future conference in Frankfurt, announcements and a welcoming ceremony.

## 10:15-13:00

# Rûniştina destpêkê:

## Şerê Cihanê yê 3. û parçekirina mertalên dewletê û desthilatdariya mêr

Di vê serdemê de ku şer dagirkerî, qeyrana ekolojîk û nexweşiyên şewbê rû dane, li aliyê eniya şoreşa jinê çi dikare bê kirin? Pergala desthilatdar ji bo nakokiyên bingehîn yên sedsala 21. razber bike, ji bo di eniya berxwedanê ya jinan de valatiyên çêbike, bi qasî pêşxistina polîtîka û rê û rêbazên nû, êrîşan jî dewam dike.

- Moderator: Meghan Bodette (Dîrektora lêkolînê, Enstîtuya Aştiyê ya Kurd)

## 1- Qamçiyê zilam-desthilatdar û tundiya dewletê ya li dijî jin û civakê

Li dijî polîtîkayên pergala desthilatdar em karin xeteke çawa ya alternatîf ava bikin? Têkoşîna jinê divê tenê di çarçoveya sererastkirina sîstemê (mafên qanûnî, kurtajê û hwd.) nemîne. Ji tundiya dewletê heta bi mejiyê mêr ê serwer, di her asta civakê de divê karibe kapasîteya têkoşîna li dijî baviksalariyê pêk bîne.

- Nîlufer Koç (Endama Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê)

- Mariam Rawi (Nûnera Yekîtiya Jinan a Şoreşger a Efganistanê / RAWA)

## 2.Qirkirina Ekolojîk: Şikandina zext, serwerî û milkkirinê: Zext û serweriya li ser xwezayê, mêtingerî û bikaranîna xwezayê bi rengekî hovane.

Jin li hemberî şîrketên pirneteweyî, şêwazên cûda yên mêtîngeriyê ku pêkanînên li ser erdnîgariyên cûda yên cîhanê tehdît dikin, çawa têdikoşin? Krîza ekolojîk weke krîza herî lezgîn a cîhanî ketiye rojeva mirovahiyê. Ev krîz li dijî jinê timî tundiyê diafirîne. Têkoşîna li dijî qirkirina ekolojiyê divê bibe pîvana sereke ya têkoşîna li dijî sîstema baviksalariyê.

- Lolita Chavez (Femînîstas Abya Yala, Gûatemala)

- Ariel Saleh (Civaknas û eko-femînîst, Awûstralya)

## 3.Şênberkirina keda nayê dîtin: Bi talankirina keda jinê û kêm mûçeyên ji bo jinê, sîstem hebûna xwe dewam dike

Em çawa dikarin têkoşîna xwe ya çînî ku xwe dispêre pîvana azadkirina jinê di nava têkoşîna li dijî bingehên mêtingeriyê ya kapîtalîst veguherîn têkoşîna esasî? Jinên ku têkoşîna çînî dimeşînin, nêrîneke welê afirandine ku hiyerarşiya çînî û amûra dewletê li ser talankirina beden û berhemên jinê ava bûne. Di nava şert û mercên heyî yên kapîtalîst de keda jinê hîn bi mezinî tê talankirin û ji nedîtî ve tê.

- Genevieve Vaughan (Aktîvîsta aştiyê, femînîst, xêrxwaz, DYE/Îtalya)

- Kavita Krishnan (Aktîvîsta femînîst, Komeleya Jinan a Pêşverû ya Tevahiya Hindistanê, Hindistan)

## 13:00-14:45 Navbera nîvro

## 15:00-18:00

# Rûniştina II.: Atolye

### 1.Berxwedana li dijî koça ji neçarî

Li dijî koça ji neçarî, pêwîstiya me bi eniyeke têkoşînê heye ku mafê mirovan ê ji bo jiyana li devera dixwaze biparêze. Ev enî ne tenê li ser pirsgirêkên jinan ên ji ber koça ji neçarî rû dane bisekine, di heman demê de karibe mirovan ji bo parastin û azadkirina xaka xwe teşwîq bike. Ji bo bersivdana li pêwîstiyan, em karin eniyeke çawa ya berxwedanê birêxistin bikin?

### 2.Azadiya jinê ku têkoşîneke stratejîk e

Ji bo rêxistin, organîzasyon û saziyên heyî yên di qadên polîtîk, çandî û aboriyê de kar dikin (yên di nava sînorê dewletan de û yên li derveyî wan sînoran têdikoşin), azadiya jinê bigirin navenda xwe û xwe bigihînin naverokeke xurt  em dikarin çi bikin?

### 3.Tenduristî

Li qada tenduristiyê em karin çi bikin? Qada tenduristiyê yek ji wan qadên bingehîn ên baviksalariyê ye ku bi desteserkirina afirîneriya jinê û bi tinehesibandina wê kiriye malê xwe û hikumdariya xwe lê dide meşandin. Em çawa dikarin hişmendî û sepandina tibeke alternativ a ne bi kara kapîtalîzmê bi rêve diçe û li gorî pêdiviyên civakê xwe birêve dibe, pêş bixînin?

### 4.Aborî

Ji bo hişmendiya aboriyeke alternatîf a bikaribe rê li ber çavtendiya zêde ya kapîtalîzmê bigire, tiştên ku divê werin kirin. Ji bo li cihanê rêxistinbûneke ku bikaribe di navbera ezmûnên aboriya me ya alternatîf de ava bike, em dikarin çi bikin?

### 5.Ekolojî

Nêzîkatiya jinê ya li têkoşîna ekolojîk divê çawa be? Têkoşîneke ekolojîk a civak û têkoşîna jinê di nava xwe de dihewîne, çawa dikare bê pêşxistin?

## 6.Parastina çand û ziman

Jin bi giranî bi rola parastina çand û ziman radibin. Li dijî hegomonyaya zimanên destnîşankirî yên kapîtalîzmê, ji bo zimanên şopên nirxên civakî yên exlaqî û polîtîk di nava xwe de dihewînin zindî bibin, divê çi bê kirin?

## 7.Avakirina eniya li dijî faşîzmê

Di têkoşînên li dijî nîjadperestî, netewperestiyê de, pêwistiya eniya jinan a antîfaşîst a li dijî faşîzmê her ku diçe mezintir dibe...

## 8.Perwerde/Felsefe

Ji bo pêşengtiya têkoşîna jinan, xwebûn; divê mirov xwe bigihîne felsefeya jiyana xwe dispêre redkirineke radîkal a li dijî hînbûnên heyî yên li ser jinê tên ferzkirin. Ji bo serkeftina di vê mijarê de, divê jin pergala xwe ya cewherî ava bikin. Lêgerîn, rê û rêbaz, pedagojiyên alternatîf  ên jinan ji bo pêşxistina xwe li erdnîgariyên cûda yên cîhanê pêş xistine, çi li ser têkoşîna jinê zêde kiriye ?

## 19:00-21:00 Konser

# 6. Mijdar

9:00-9:15 Opening and announcements

9:15-11:30

## Rûniştina III.  Avakirin-Jiyana li bendê, ne bi mûcîzeyan bi şoreşê pêkan e

Ji bo rawestandina êrîşên pir alî yên sîstema baviksalar ên li dijî jinê em çawa dikarin têkoşîna xwe xurtir bikin? Mifteya diyarkirina karakterê demê, têkoşîna entellektûel û îdeolojîk a jinê ye, ku li dijî mêtingeriya dîrokî dimeşînin.

- Moderator: Rahila Gupta (Nivîskar û aktîvîst, Îngilistan)

### 1-Bihurandina parçebûna ji aliyê feraseta desthilatdar ve hatiye avakirin: Çînî, netewperestî, olperestî

Em çawa karin xwe ji bin fikrê sîstema serweriya mêr rizgar bikin? Heta ku paradîgmayeke rasteqîn neyê afirandin -yanî paradîgmayeke ku sînorên sîstemê bi rastî jî dibuhure û xwe dispêre rexneyên teorîk û entellektûel- rîsk heye ku têkoşînên jinê ji aliyê sîstemê ve bêne asîmîlekirin.

- Niemat Kuku Mohamed (Damezrînera Navenda Perwerde û Lêkolînê ya Zayendî ya Civakî, Sûdan)

- Dilar Dîrîk (Civaknasa siyasî û nivîskar)

### 2.Femînîzm- Serhildana mêtîngeriya herî kevin û jê wêdetir çi heye?

Sedemên xitimandina femînîzmê çi ne? Ji bo femînzm bibe xwedî sekneke dij pergalê çi divê?

- Dr. Anjila al-Maamari (Navenda Lêkolînên Stratejîk ên Piştgiriya bi Jin û Zarokan re, Yemen)

- Marta Dillon (Nivîskar û femînîst, Tevgera NiUnaMenos, Arjantîn)

### 3.Sosyolojiya Azadiyê û Jineolojî

Jineolojî, ji bo veguherandina nirx, tecrûbe û agahiyên ji çanda civakî yên bi şoreşa jinê hatine afirandin, dikare roleke çawa bilîze? Feraseteke entellektûel a ku xwe dispêre paradîgmayeke alternatîf kare nirxên berxwedana jinê bike bingeha şoreşê.

- Elîf Kaya (Jineolojî)

- Jules Falquet (Aktîvîsta femînîst û profesora felsefeyê, Fransa)

11:45-14:15

## Rûniştina IV.: Vîzyona me-Azadkirina Jiyanê

### 1. Divê çawa bê jiyîn, çi bê kirin, ji ku bê destpêkirin?

Ji bo têkbirina baviksalariyêû avakirina hevjiyana azad, divê mêrtî ji ber pencên baviksalariyê bê rizgarkirin. Em ji vê yekê çi fêm dikin? Li derveyî têkiliyên civakî yên di çarçoveya mulk û desthilatdariyê de hatî avakirin, li derveyî sînorên têkiliyên zayendî yên civakî, jin û mêr pênasekirin. Divê em ji vê yekê çi fêm bikin?

- Deniz Abukan (Tevgera Jinê ya Azad TJA, Bakurê Kurdistanê, Tirkiye)

### 2. Xwe birêxistin bike!

Amûra herî bingehîn a herikbarî, têkoşîn û berxwedana jinê ji ber lepên mêr derxistin e rêxistinbûna xweser. Rêxitinbûneke jinan a tevahiya nanokiyên çînî, bawerî, çandî, etnîk, cûdahî û hemû beşên civakê çareser dike, çawa pêş dikeve?

● Jade Daniels (Tevgera Jinê ya Reş a RA Life Urban Self Defense System, DYE)

● Asya Abdullah (Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD, Rojava/Bakurê Sûriyeyê)

### 3. Parastina Jiyanê: Ji şer re na, ji xweparastinê re erê!

Aliyê ku xweparastinê ji mîlîtarîzmê cûda dike çi ne? Xweparastineke bi etîk û estetîka jinê hatî hûnandin, ji aliyê civakê ve çawa tê fêmkirin? Ji bo pêkanîna modela xweparastineke bi yekkirina raman û pratîkê pêşketî, divê rêyeke çawa were şopandin?

● Vilma Rocío Almendra Quiguanás (Ji gelê Nasa yê xwecihî, ji rêxistina Pueblos en camino a li Kolombiyayê)

● Hêza Şengal (Aktîvîsta Êzidî, Şengal/Sîncar)

### <u>14:15-15:30 Navbera Nîvro</u>

### <u>15:30-18:30</u>

# Rûniştina V.: Rêya xwe dîtin

## Jin, Jiyan, Azadî: Çima rêxistinbûneke jinanan a navneteweyî? Pêşniyara jinan a‘’Konfederalîzma Demokratîk a Cihanê” çi ye?

Li dijî êrîşên îdeolojîk ên pergalê, ji bo pêhisandina jinê were pêşxistin tiştên ku werin kirin: Li hemberî êrîş, kiryar, polîtîkayên derbasî nav hev bûne yên bi rûpoşan hatine pêçandin ên baviksalariyê, tevahiya têkoşînên jinan ji bo bikaribin baviksalariyê têk bibin, wê çawa bikaribin bihevrebûna pîvanî ava bikin?

● Moderator: Havîn Guneşer (Endezyar û Însiyatîfa Navneteweyî ya Azadî ji Ocalan re, Aştî ji Kurdistanê re)

- Haskar Kirmizigul (Tevgera Jinên Kurd)
- Montes Jovita Mataro (Tifaqa Jinê ya Navneteweyî, Fîlîpîn)
- Boushra Ali (Koalîsyona Jinê ya Demokratîk, Herêma MENA)
- Nûnera Gemeinsam Kaempfen (Em bi hev re têbikoşin, Elmanya)
- Îrem Gelkûş (Tifaqa Jinê/Jin bi hev re xurt in, Tirkiye)
- Ñizol Lonko Juana Calfunao (Xelkê xwecihî yê Mapuche, Komuna Cunco, herêma Araucanía, Şîlî)

## 18:30-19:00 Şîroveyên li ser girtinê

Axaftvan



## Meghan Bodette

Meghan Bodette li Enstîtuya Aştiyê ya Kurd a li Washingtonê dîrektora lêkolînê ye. Ji Zanîngeha Georgetownê li qada Dîplomasiya Navneteweyî lîsans wergirtiye û li vê derê giranî daniye ser hiqûqa navneteweyî, organîzasyonên navneteweyî û mijarên exlaqî. Têkildarî maf û statuya jinan ên li Sûriyeyê li herêmên di bin serweriya hin aktorên siyasî û leşkerî de ne, lêkolîn kir û encamên vê lêkolînê jî bi rayedarên hikumetan û saziyên navneteweyî re parve kir.



## Nilüfer Koç

Nîlufer Koç ku li bajarê Erdexan ê Bakurê Kurdistanê ji dayik bû, endama Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) û berdevka Komîsyona Têkiliyên Derve ya KNK'ê ye. Karê xwe yê siyasî yê niha, hewldana ji bo diyaloga neteweyî ya navbera partiyên siyasî û rêxistinên civakî yên li Kurdistanê ye. Nîlufer li gel hewldanên ji bo yekîtiya neteweyî, ji bo mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya gelê Kurd û pêkhateyên etnîkî û olî yên li Kurdistanê di asta navneteweyî de bi rengekî çalak dixebite.

## Mariam Rawi

Mariam Rawi endama Komeleya Şoreşger a Jinên Efganistanê (RAWA) ye. Gava ku li Pakistanê zarokeke penaber bû, heta ku firsend bi dest xist ji bo biçe dibistana RAWA, ji perwerdeyê bêpar hate hiştin. Li wê derê ne tenê hînî xwendin û nivîsandinê bû, di heman demê de baweriya xwe pê anî ku ji bo mafên jinan divê têbikoşe. Sala 1996'an tevlî nava RAWA bû û ji hingî ve beşdarî karên civakî, perwerde, çandî, dîplomatîk û siyasî yên komê bû. Bû yek ji endamên çalak ên komê.



## Lolita Chavez

Aura Lolita Chávez Ixcaquic, endama Consejo de Pueblos K'iche (CPK) ye ku tevgereke civak û gelên li dijî ekstraktîvîzm, neolîberalîzm, mêtingerî, emperyalîzm û baviksalariyê ji bo têkoşîna li hemberî Peymana Bazirganiyê ya Serbest (FTAA) ya navbera Emerîka Navîn û Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê di sala 2007'an de hate avakirin. Di sala 2017'an de ji bo Xelata Sakharov a Parlamenta Ewropayê bûbû fînalîst. Ji xelkê Maya yê xwecihî ye.



## Ariel Saleh

Ariel Salleh endama Zanîngeha Global a ji bo Dewamiyê; Profesora Mêvan a li Zanîngeha Nelson Mandela, li Zanîngeha Sydneyê li qada Aboriya Polîtîk Doçent a berê û li Zanîngeha Jena Friedrich Schiller jî lêkolînera li qada Civakên Piştî Mezinbûnê ye. Salleh hunera xwe ya lênihêrînê û agahiyên Xwecihî jinûve dinirxîne û ji 'aboriya kes' a neolîberal heta bi eko-sosyalîzmê gotinên edalet û dewamiyê rexne dike. Gelek gotarên xwe li ser vê mijarê hene. Mînak: Ecofeminism as Politics- Ekofemînîzm weke rêbazeke siyasetê (2017/1997), Eco-Sufficiency & Global Justice- Têrkeriya Eko & Edaleta Global (2009), Pluriverse- Gelek Gerdûn (2019). www. arielsalleh.info.



## Genevieve Vaughan

Genevieve Vaughan lêkolînereke serbixwe, nivîskar û edîtora gelek pirtûkan û damezrînera gelek saziyan e: Weqfa Civaka bi rehm (1988-2005) ku bi temamî ji jinan pêk tê, Perestgeha Sekhmet a Xwedawenda Misra Kevn a li nêzî qada testa nukleer a li Çola Nevada (Ji 1992'an heta vê demê), Tevna Femînîst a navneteweyî ya ji bo Aboriyê ya Diyarî (Ji sala 2001'ê heta vê demê). Malperên xwe yên internetê: www.gift-economy. com ve www.MaternalGiftEconomyMovement.org. Li ser van malperan du hefteyan carekê bêpere li salonên Zoomê dikarin xwe qeyd bikin ku paradîgmaya diyariyê ya alternatîfeke radîkal a li kapîtalîzma baviksalar tê nirxandin.



## Kavita Krishnan

Kavita Krishnan aktîvîsteke femînîst e ku li Komeleya Jinan a Pêşverû ya ji bo Tevahiya Hidistanê dixebite. Krishnan beriya niha di nava Partiya Komunîst a Hindistanê (Marksîst-Lenînîst) Liberationê, endametiya komîteya navendî û polîtburoyê kir. Krishnan bi aktîvîzma li dijî tundiya zayendî tê naskirin. Nivîskara pirtûka Fearless Freedom (Azadiya bêtirs) e.



## Rahila Gupta

Rahila Gupta rojnamevaneke serbest, nivîskar, aktîvîst û demeke dirêj e endama Southall Black Sisters e, ku li Îngilistanê yek ji rêxistinên jinên hindkahî û reş a sereke ye. Di mijara tundiya li nava malbatê de, mînak têkildarî jinên mexdûrê destavêtinê yên cînayet kirine, guhertinên di şertên koçberiyê de pêşengî ji gelek kampanyayên girîng re kiriye. Di nava pirtûkên wê de berhevkareke ku edîtorî jê re kiriye heye: From Home- breakers to Jailbreakers: Southall Black Sisters (2003). Gotarên wê Guardian, li kovar, rojname û malperên New Humanist, New Internationalist û openDemocracy hatin weşandin. Serdana Rojava kir û yek ji piştevanên Peace in Kurdistan e.



## Niemat Kuku Mohamed

Niemat Kuku Mohamed aktîvîsteke mafên jinan û pispora pêşvebirinê ye. Damezrînera Navenda Perwerde û Lêkolînê ya Zayendî ya Civakî ya li Sûdanê ye. Zêdeyî 25 sal in xwedî tecrûbeya lêkolînê ye û karên wê li gelek pirtûk û kovaran hatine weşandin.



## Dilar Dirik

Dilar Dîrîk aktîvîst, civaknasa siyasî û nivîskar e. Li Zanîngeha Oxfordê li Navenda Karên Penaberan lêkolînê dike û dersê dide. Nivîskara pirtûka "The Kurdish Women's Movement: History, Theory, Practice" (Pluto Press, 2022)- Tevgera Jinê ya Kurd: Dîrok, Teorî, Pratîk' e. Li Ewropayê bi rengekî çalak cihê xwe di nava tevgera jinên Kurd de digire.



## Dr. Anjila al-Maamari

Dr. Anjila Sultan Al-Maamari akademîsyeneke ku di qada tenduristiya derûnî û piştgiriya derûnî de pispor e. Di mijarên wekî hemwelatîbûn, demokrasî, avakirina aştî û mafên jinan de şêwirmendiyê dike. Ew di xebata lêkolînên ser wesfê û di amadekirina pêşnûmeya belgeyên siyaseta giştî de pispor e. Ew hev-avakara Civata Sivîl ji bo Ciwanên Taizê ye, ku ew niha rêvebiriya wê dike û hev-avakara Tora Jinan a Yemenê û serokê dezgeha aştiyê ye.



## Marta Dillon

Marta Dillon a Arjantînî nivîskar, rojnamevan û aktivîsta femînîst a lezbiyen e. Ew edîtorê pêveka las12 ya Página 12'an e, pêşkêşvana radyoyê Pasamos Todes û endama Colectivo NiUnaMenos e.



## Elif Kaya

Elîf Kaya endama Akademiya Jineolojiyê ye û di desteya rêveber a kovara Jineolojiyê de cih digire. Dema xwendekar bû ji ber xebatên xwe yên siyasî hat girtin û gelek salan di girtîgehê de ma. Piştî ku di sala 2003'an de hat berdan, di qadên cuda yên tevgera jinên Kurd de xebitî. Di sala 2009'an de ji ber xebatên xwe yên siyasî careke din hate girtin. Di sala 2014'an de bi jinên din ên girtî re li ser çapkirina pirtûka Nîqaşên Jîneolojî xebitî. Gotarên wê di kovar û rojnameyên cuda de, bi taybetî jî di Jinolojiyê de hatin weşandin.



## Jules Falquet

Jules Falquet niha jî li Fransayê li Zanîngeha Parîs 8 St Denîs Profesora Felsefeyê ye. Falquet ku aktîvîsteke lezbiyen û femînîste, li Meksîka, El Salvador û deverên din ên Emerîkaya Latîn û Karayîpê jiyaye û xebitiye. Ew endama Laboratoire d'études et de recherches sur les Logiques Contemporaines de la Philosophie (Navenda Xebat û Lêkolînê ya ji bo Mantiqa Hemdem a Felsefeyê, LLCP) ye. Pirtûka wê ya herî dawî Imbrication: Femmes, race et classe dans les mouvements sociau (2020) - Qetmerkirin: Di tevgerên civakî de rewşa jin, nijad û çînî.



## Benedetta Argentieri

Benedetta Argentieri rojnamevan, nivîskar û derhênerê fîlma belgefîlm a Îtalî ye. Ji sala 2014'an ve li Rojhilata Navîn xebatên xwe dimeşîne, li ser şer dinivîse û bal dikişîne ser jinan û têkoşîna wan. Fîlma wê yê dawîn bi navê The Matchmaker di Festîvala Fîlman a Venedîkê de hat nîşandan.

## Deniz Abukan

Denîz Abukan aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) ye. Di dema xwendekariya Zanîngeha Dîcleyê de tevlî tevgera jinan dibe. Ji ber xebatên xwe 7 sal û nîv di girtîgehê de ma û ji roja ku hatiye berdan heta niha bi TJA'yê re dixebite.



## Jade Daniels

Jade Daniels hunermendek tevgerê, çalakvan û nivîskarek e ku niha li Los Angeles, California ye dijî. Jade wekî Organîzatorê Ragihandinê li Grassroots Global Justice Alliance dixebite. Li DYE'yê bi Tevgera Jinên Reşik a Ra Lîfe Urban Self Defense System re xwe bi rêxistin dike. Ew endam û organîzetora çalak a Black Lives Matter-Los Angeles e û li navenda Los Angelesê Afro-fütüristik Queer Femme di desteya rêvebir a kolektîfa Hunermenda a Snatchpower de kar dike. Wê herî dawî ji bo piştgirî û hevkariya bi têkoşîna femînîst a Afro-Brazîlya, çîna karker, feqîr û xizan re çû Brezîlyayê.



## Asya Abdullah

Asya Abdullah Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Berê jî Hevserokatiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), endama Meclîsa Rêveber a Kongra Star û endama damezrîner a Meclîsa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bû. Dema DAÎŞ'ê di sala 2014'an de êrîşî Kobanê kir, beşdarî parastina bajêr bû. Di dîplomasiya navneteweyî û nav kurdan de jî roleke girîng dilîze.



## Vilma Rocío Almendra Quiguanás

Vilma Rocîo Almendra Quiguanás damezrîner û beşdarek çalak a "Association of Cabildos del Norte de Cauca-ACIN "in "Fabric of Communication and External Relations for Truth and Life " e. Ew niha endamê "Pueblos en Camino" ye ku înîsiyatîfek armanc dike ku berxwedan û xweseriya di navbera gelan û pêvajoyan de girêbide. Ew xwediyê dereceyên bilind a Zanîngeha Puebla Meritorious Autonomous a beşa Sosyolojiyê ya li Meksîka yê. Her du jî ji Cauca ne (ji hela dagirkeran navê Kolombiya hatî lêkirin) ku keça dayikek Nasayî û bavek Misakî ye.



## Heza Şengal

Heza Şengal ku di belgefîlma Hêzayê de cih digre, aktivîstekî Êzidî ye ku piştî ji destê DAÎŞ'ê rizgar dibe li dijî DAÎŞ'ê şer dike û yek ji kesên ku qirkirinê jiyan kiriye ye.



## Havin Guneser

Havîn Guneşer endezyar, rojnamevan û aktivîstê mafên jinan e ku li ser ramanên siyasî yên Abdullah Ocalan dinivîse û axaftinan dike. Yek ji berdevkên însîyatîfa navneteweyî ya "Azadî ji Abdullah Ocalan re, Aştî ji Kurdistanê re" ye. Gelek pirtûkên Ocalan werger kiriye û nivîskarê Hunera Azadiyê ye.



## Haskar Kirmizigul

Haskar Kirmizigul zêdeyî 20 sal in aktivîsta mafên jinan e. Li Kovara Jinan a Sorgul û Roj TV de rojnamevantî kiriye. Xebatên wê li rojnameyên Kurdî, Yenî Ozgur Polîtîka, Newaya Jin û Komun Academy hat weşandin û bi zimanên cuda hatin wergerkirin. Li welatên Ewropa û Latîn Amerîkayê li ser Jinelojî û tevgerên jinên Kurd konferansan daye. Hina jî endama lîjneya weşanê ya kovara Jinelojiyê ye û di heman demê de çêkerê bernameyekî li ser jinelojiyê ku heftiyê du caran li JIN TV tê weşandin.



## Montes Jovita Mataro

Jovite Mataro Montes an jî ji bo malbat û hevalên xwe "Obeth" di bûyerên tundiyê yên jin û zarokan de xwedî tercubeyek e. Psîkologê sereke yê beşa şêwirmendiya piskolojî ya Bernameya Parazvanî Gabrîela û Bernameya Xizmetên li hemberî Jin û Zarokan e. Du serdem Cîgira Sekreteriya Giştî yê Têkiliyên Derve ya Gabrîela kiriye.• Boushra AlîBoushra Alî, seroka Komeleya Jinan a Jîne û endama serokatiya Tifaqa Demokratîk a Jinên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê (NADA) ye. Kurdekî ji Sûriye ye, ji endezyariya avahîsaziyê mezûn bûye, her wiha nivîskar û wergervane.



## Boushra Ali

Gemeinsam Kämpfen, "Têkoşîna bi hev re" kampanyayekî femînîste ku di 25'ê Mijdara 2017'an de ji bo "xwerêveberî û xwesriya demokratîk" hate destpêkirin. Armanca kampanyayê ewe ku ramanên şoreşger yên Hêrêma Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li Elmanyayê zêdetir bidin naskirin û bi tevgerên jinan re têkiliyekî enternesyonalîst pêk bînin.

## Gemeinsam Kaempfen

Îrem Gelkûş Berpirsa Weşan û Ragihandina Komeleya Jinan, Komeleya Mafên Mirovan a Jinan-Çareseriyên Nû ye. Ji Beşa Civaknasiyê yê Zanîngeha Bogazîçiyê mezûn bûye. Platform û rêxistinên ku zêdeyî 5 sal in nav tevgera femînîst û tevgera jinan cih digirin, li Jin Bi Hevre Hêz in, Koma kampanyaya Bila Peymana Stenbolê bê pêkanîn, Zemîna Derîzî û di komîsyonên amadekar ên Meşa Şeva Femînîst a çarçoveya 8'ê Adarê û 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinê, cih digre.



## Irem Gelkus

Îrem Gelkûş Berpirsa Weşan û Ragihandina Komeleya Jinan, Komeleya Mafên Mirovan a Jinan-Çareseriyên Nû ye. Ji Beşa Civaknasiyê yê Zanîngeha Bogazîçiyê mezûn bûye. Platform û rêxistinên ku zêdeyî 5 sal in nav tevgera femînîst û tevgera jinan cih digirin, li Jin Bi Hevre Hêz in, Koma kampanyaya Bila Peymana Stenbolê bê pêkanîn, Zemîna Derîzî û di komîsyonên amadekar ên Meşa Şeva Femînîst a çarçoveya 8'ê Adarê û 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinê, cih digre.



## Ñizol Lonko Juana Calfunao

Ñizol Lonko Juana Calfunao Rayedara Lof Juan Paillalef'ê (Komuna Cunco, Herêma Araucanía, Şîlî) Di tevgera berxwedana gelê Mapuche, parastina axa bav û kalên xwe û li dijî derketina binpêkirinên mafên mirovan ku li ser civakê ji aliyê şîrketên ku li herêmê projeyên binesazî û pêşketinê dikin ve tên kirin de, rolek wê ya girîng heye.

Network Women Weaving the Future

Cenî

TJK-E
TEVGERA JINÊN KURD LI EWROPAYÊ

TJA
TEVGERA JINÊN AZAD

Kongra Star

INTERNATIONAL INITIATIVE
Freedom for Abdullah Öcalan - Peace in Kurdistan

Jineolojî Center

مركز الدراسات الإستراتيجية لدعم المرأة والطفل
Center for Strategic Studies to Support Women and Children

CCRS

IWA
INTERNATIONAL WOMEN'S ALLIANCE

FEMINISTAS DEL ABYA YALA


http://womenweavingfuture.org
info@womenweavingfuture.org

# OUR REVOLUTION: LIBERATING LIFE

**05-06 Nov 2022** II. INTERNATIONAL CONFERENCE

**Berlin/Germany**



## Network Women Weaving the Future

- WORLD WAR III AND SMASHING THE ARMOR OF IMMUNITY OF THE STATE AND THE DOMINANT-MALE
- ECOCIDE: THE SUBORDINATION AND COLONIZATION OF NATURE AND THE RUTH-LESS APPROPRIATION AND EXPLOITATION OF RESOURCES
- DEFEND LIFE: NO TO WAR, YES TO SELF-DEFENSE
- FEMINISM—THE REBELLION OF THE OLDEST COLONY AND WHAT LIES BEYOND IT
- JIN, JIYAN, AZADÎ: WORLD DEMOCRATIC WOMEN'S CONFEDERALISM
- WORKSHOPS

**Simultaneous Translation:** Kurdish, English, German, Turkish, Arabic, Italian, Spanish And French
**Registration:** Please register until October 1st under registration@womenweavingfuture.org

**For more information visit, http://womenweavingfuture.org**
**E-mail, info@womenweavingfuture.org**

@womenweavingfuture2022 @Womenweaving2

Grafikdesign: Aslı Filiz

**TECHNICAL UNIVERSITY BERLIN**

Strasse des 17. Juni 135 / 10623 Berlin

Network Women Weaving the Future

http://womenweavingfuture.org
info@womenweavingfuture.org

Grafikdesign: Asli Filiz